Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1304 | 3-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 2 cihên şûnwariyê...(5)




**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê û Dêra Suryanî û Keleha Ceiber e.**

**Dêra Suryanî:**
Dêra Suryanî yek ji nîşaneyên şûnwarî ye ku gewrebûna dîroka Minbicê ya kevin dide nîşandan. Herwiha ew mîna cewherekê ye ku mîrata xwe vedibêje. Ev dêr û sûrê derdora wê li taxa Sînaa ya li nîva Minbicê dikeve (li nav taxên tije milet û jiyan). Ji vê taxê re taxa Pîzentî tê gotin. Dema împiratoriya Romanî ket dînê Xiristiyanî, ev ol li ser destê Împiratorê Romanî, Qistentîn li vê herêmê belav bû. Di encamê de cihên gawirtiyê û hemû gorên heyî bûn mezargeh û paşê dêr. Ev yek jî girîngiya wan kesên jiyana xwe ji dest dan, dide diyarkirin, nexasim di qonaxa belavkirina olê ya bi dizî de. Qistentîn, hemû kevneşopiyên girêdayî efsane, rêûresmên kevin ên girêdayî gawirtiyê ji holê rakirin û li şûna wan dêr bi cih kirin. Ev dêr jî mezargehên Xiristiyaniyê ne ku wan di destpêka ola Xiristiyanî di bin sîwana Romanan de jiyana xwe kirin qurban.

**Keleha Ceiber:**
Keleha Ceiber di hindirê giravê de li aliyê çepê yê Çemê Feratê li Reqayê dikeve. Nêzî 15 kîlo metreyan dûrî bendavê ye û 50 km dûrî bajarê Reqayê ye. Herwiha li Gola Tebqayê ya ku di sala 1975'an de hatiye avakirin, dinêre. Keleh li ser zozanekî klisînî yê sist hatiye avakirin, bilindahiya wê ji asta deryayê digihêje 347 metreyan. Teşeyekî dirêjînî yê vê kelehê heye û dirêjahiya wê ji bakur heta başur 320 metre ye û ji rojhilat ber bi rojava 170 metre ye. Du sûrên mezin wê dorpêç dikin, yek ji hindir ve û ya din jî ji derve de ye û tenê bi çend metreyan dûrî hev in ku di navbera herduyan de koridorek tê teşekirin û gelek burcên berevaniyê digre nava xwe ku ji 35 burcan zêdetir in. Hin Ji wan çargoşeyî ne û hin nîvşeşgoşe û nîvheştgoşeyî ne û hinên din nîvgirover in. Bi domana dîroka xwe du nav li xwe hilgirtiye: Di dema berî Islamê de Doserî bû û Caber di çerxa pêncem a koçî/ yazdehem a zayînê bû.

# 'Wê 24 kom tevlî Mehrîcana Şehîd Ronahî Bawer bibin'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**15'ê Îlonê de wê Mehrîcana Heftemîn ya Şehîd Ronahî Bawer a Govendê, li dar bikeve, hevserokê TEV-ÇAND Xelîl Tehlo destnîşan kir ku wê zêdeyî 24 komên govendê ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Bakur û Rojhilatê Kurdistanê tevlî Mehrîcana Şehîd Ronahî Bawer bibin.**



TEV-ÇAND bi hevkariya Komîna Dîlanê amadekariyên xwe ji bo lidarxistina Mehrîcana Heftemîn ya Şehîd Ronahî Bawer a Govendê, dike.
Herwiha bi durşmeya "Her dîlanek çîrokeke û her çîrokek dîrokeke" wê mehrîcan bi şêweyekî folklorî li pêş Navenda Mihemed Şêxo a Çand û Hunerê bi kariwanekî hespan li gel kêliyên hunerî dest pê bike û heya Parka Azadî berdewam bike.
Mehrîcan wê di 15'ê Îlûnê de were destpêkirin, wê bi du rojan bidome, derbarê heman mijarê hevserokê TEV-ÇAND, Xelîl Tehlo ji rojnameya me re axivî.

### 'Wê 24 kom tevlî mehrîcanê bibin'

Xelîl Tehlo destnîşan kir ku wê 24 komên govendê tevlî Mehrecana Şehîd Ronahî Bawer tevlî bibin û wiha got: "Di vê mehrecanê de wê 24 komên dîlanê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rojhilat û Bakurê Kurdistanê beşdar bibin. Armanca TEV-Çandê ew bû ku ser asta Sûriyê, hem jî tevahiya Kurdistanê jî kom mtevlî bibin, lê ji ber hin astengiyan dibe ku nikarbin amade bibin. Komên Bakur û yên Rojhilatê Kurdistanê dixwazin tevlî bibin, lê şertûmerc ne alîkar in, dibe ku ew jî werin amade bin, ji ber ku hîna rewş ne zelal e, lê eger nikarîbûn amade bibin wê bi riya dîmen beşdar bibin. Zêdetirî 20 komên ji herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wê tevlî bibin. Me dixwest ku ji derveyî Bakur û Rojhilatê Sûriyê mîna devera Silemiyê, hem jî Siwêda û Berava Sûriyê beşdarî mehrecanê bibin, rewşa ku tê de dijîn ne alîkar e."

### 'Armanc ew e ku çanda hemû gelan bi govendê were nasîn'

Hevserokê TEV-ÇAND Xelîl Tehlo diyar kir ku armanca wan ew e ku hemû pêkhate çanda xwe ya resen bi riya govendê pêşkêş bikin û wiha qedand: "Îsal asta beşdarbûna koman gelekî baş e, tevî ku me mercên tevlûbûnê zortir kiriye jî, lê hemû pêkhate bi hejmareke baş wê tevlî bibin. Di salên bûrî de mehrecan bi tevahî li holên Rimêlan û Hesekê dihatin lidarxistin, îsal me xwest ku li Parka Azadî di nav gel de çêbikin. Me weke komîteya nirxandinê biriyar da ku êdî pêwîst nake astên yekem, duyem û sêyem werin destnîşankirin. Ji ber ku her komek nûnertiya çand û folklore netewa xwe dike, bila her kes bizanibe huner nabe amûrek ji bo qezenckirina madî û pêwîst e nekeve mijarên bazirganiyê. Em dixwazin hemû pêkhate çanda xwe bi riya govendê were nasîn, hem jî restentiya govenda Kurdî û hem jî ya hemû pêkhateyên Sûriyê were pêşkêşkirin. Em bi hêvî ne ku govend bi rengekî xweş û xwedî çîrokên xweş bên pêşkêşkirin û li gorî dilê gelên me bin."
Hêjayî gotinê ye ku Mehrîcana Yekemîn a Govendê ya Şehîd Ronahî Bawer di sala 2015'an de li ser asta Kantona Cizîrê li bajarê Rimêlan li dar ket. Piştre şaxên vê mehrîcanê erferhtir bû da ku komên govendê yên hunerî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Kurdistanê tevlî bibin.
Hêjayî bibîrxistinê ye ku Şehîd Ronahî Bawer (Ronahî Hemo) ji Efrîn ye, ew şoreşgerek bû di nav refên Hêzên Parastina Gel (HPG) de bû di heman demê de endamek komek govendê bû. Ew di 2019'an de li Herêmên Parastinê yên Medyayê şehîd bû, lewma jî navê mehrecanê li ser navê wê hat kirin.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER BÊHÊZBÛNÊ**

**Bizina kol xwe bi şîrê xwe li cem xwediyê xwe şîrîn dike:**
- Taybetiyên wî yên din nînin, ew jî xwe bi wê taybetiya xwe dide qebûlkirin.
**Destên min li pişta wî nagihin hev:**
- Ez pê nikarim; hêza min pê nagihe; ji qeweta min der e.
**Destê min lê napêçe:**
- Bi heman wateyê.
**Devê pisîkê negigihîşt goşt, digot min bi xêra dêbavan hişt:**
- Ji ber ku bi destê wî nakeve dibêjê ez naxwazim.
**Devê rûvî nedigihat tirî digot tirş e:**
- Bi heman wateyê.
**Dîwarê te nizim be, wê her kes bikare bikeve hewşa te:**
- Ku tu qelsemêr bî, nerm bî wê ti kes paxavan ji te neke.
**Em bêqirem in:**
- Em bêhêz in; pişta me nîne.
**Em li ber dohnê xwe nabin qelî:**
- Em hê negihîştine; em hê lewaz in; em hê xizan in.
**Ez li zik dixim, ew dibêje, ay pista min:**
- Ji bo kesên bêpişt tê gotin.
**Hevalê lingê şkestî nînin:**
- Kesê xizan û bêkes be, ti kes hevaltiya wî nake.
**Ji bin derneket:**
- Ji heq derneket; nikarî bike; neqedand; di nîvî de hişt.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman




## 'Damezrandina Komisyona Demokrasî Xuşk- Biratî û Hevgirtina Netewî gavek girîng e'



Parlementerê Partiya DEM ya Amedê Mehmet Kamaç destnîşan kir ku piştî banga Aştî û Civaka Demokratîk, damezrandina Komisyona Demokrasî, Xuşk-Biratî û Hevgirtina Netewî gaveke girîng û erênî ye ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd."**R-5**

## Bêrîvan Omer: Koka çareserkirina pirsgirêkên ekolojî nenavendîbûna sîstema ne

Hevseroka Şaredariya Qamişlo Bêrîvan Omer diyar kir ku têkiliya mirov bi hawîrdorê re awayê jiyana mirovan dide diyarkirin, dema hevsengî di navbera wê têkiliyê de hebe, jiyana mirovan li ser erdê tê parastin...**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1304 | 3-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Akademiya Civaka Demokratîk: Afrînera fikirê demokratîk û azadiyê ye



Selwa Ehmed diyar kir ku Akademiya Civaka Demokratîk di qada perwerdeya civakî di herêmê de xwedî rol û girîngiyeke mezin e û wiha got: "Perwerde û xebatên fikirî li ser esasê azadiya jin, demokrasî û ekolojî tên dayîn."**R-6**

## 'Desteya Hevbeş nêzîkbûnên yekîtiyên rewşenbîran xurtir kir'



Cîgira serokê Desteya Rewşenbîr û Nivîskarên Rojavayê Kurdistanê Anahîta Sîno destnîşan kir ku desteyê hevgirtina yekîtiyan xurtir kir û got, "Armanca nivîskar û rewşenbîrên Rojava ew e ku bi hev re xebateke yekgirtî li ser asta Rojava û Kurdistanê bidin meşandin."**R-7**

# SIYASETA HIKUMETA VEGUHÊZ XIZMETA ÇARESERIYÊ NAKE

Hevserokê Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo da zanîn ku di pêkanîna peymana 1'ê Nîsanê de pirsgirêk hene, li derdor wê tê zivrandin û hikumeta veguhêz dixwaze cewherê wê bê wate bike û got, "Hikumeta veguhêz bi siyaseta dorpêça li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dixwaze vîna gel bişkîne û berdewamiya dorpêçê jî wê pirsgirêkên heyî aloztir bike."**R-4**



## Li herêmên dagirkirî sûcên dijmirovî



Herêmên Sûriyê yên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê ve hatine dagirkirin, veguherîne navendên sûcên dijmirovî. Ev çend sal in gelên li van herêman dijîn bi kuştin, revandin , işkence û talakirinê re rû bi rû dimînin.**R-3**



**Hikûmeta veguhêz ji nepêkanîna peymana 10'ê Adarê berpirsyar e**
Dilyar Cizîrî R-4



**Erdogan di qirkirina Kurdan de bi israr e...**
Zekî Bedran R-5



**Serdema Aştiyê**
Farûk Sakik R-5

# Bêrîvan Omer: Koka çareserkirina pirsgirêkên ekolojî nenavendîbûna sîstema ne

Hevseroka Şaredariya Qamişlo Bêrîvan Omer diyar kir ku têkiliya mirov bi hawîrdorê re awayê jiyana mirovan dide diyarkirin, dema hevsengî di navbera wê têkiliyê de hebe, jiyana mirovan li ser erdê tê parastin, lê têkiliya xurt bi ekolojîk re ya jinê ye û sîstema navendî pirsgirêkên hawîrdorê zêde dike û got, "Sîstema nenavendî koka çereseriya pirsgirêkên ekolojîke."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê girîngiya ekolojîk, girêdana jin bi ekolojîk re û parastina ekolojî, Hevseroka Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Bêrîvan Omer bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Wateya ekolojî û girîngiya wê ji bo civakê çi ye?**

Gotina ekolojî bixwe ew zanista ku lêkolînan li ser têkiliya di navbera zindiyan de dike, hemû zindiyên heyî di nav wan de jî mirov. Têkiliya mirov bi xwezayê re, mijarekî pir girînge ku awayê jiyana mirovan dide diyarkirin, çiqas hevsengî di navbera wê têkiliyê de hebe, ewqasî jiyana mirovan li ser wê erdê tê parastin, lê çiqasî ew têkilî xerab be yan jî ji aliyekî de be, wê demê jiyana civakê li ser wê erdê zehmet dibe. Lewma hevsengiya di navbera mirov û xwezayê de, mijara herî girînge. Dema em behsa ekolojî jî dikin, wê demê mijara me ya herî girîng ekolojiya civakê ye. Ekolojiya civakê û têkiliyên di navbera civak û hawirdorê de, bandora wan li ser hev heye. Kesên ku herî zêde li ser vê nivîsandine Murad Bokîn bû, piştî wê jî Rêber Apo wek felsefeyekê girte dest ku çareseriya pisgirêkên civakî ji ku derê dest pê dike? ji rêxistinkirina civakê bi sîstema rêveberiyê. Bingehê ekolojiya civakê ew e ku civak bixwe xwe birêve bibe û nenavendî be, yanî her tiştê ji mirovan re pêwîst be, li gorî pêwîstiya xwe bikar bînin, ev jî pişta xwe dide pernsîbên civaka xwezayî ku mirov bi hev re di hawirdorekî tendurist û têkiliyên hevseng de jiyan dikirin. Lewra ji bo ev pirsgirêk bidawî bibe, gerek civak dîsa hevsengiyê ava bike û ji bo ava bibe gerek mirov bixwe biryara xwe bide. Niha jî pêwîst e awayên sîstama civakê ya rêveberiyê bê guhrandin ku bibe li ser bingehê komînan, ji ber komîn dibe beşekî civakê ku dikare bixwe biryar bide û bixwe li ser herêma xwe ya erdnîgarî nekêle pirsgirêkên hawîrdorê derdikevin. Pirsgirêkên hawirdorê herî zêde jî, ji navendîbûn û kapîtalîzmê derkeve. Navendîbûn hiştiye ku kombûyîna insanan pir be û bajarên mezin ava bibin, hem jî sîstem navendî pir girîngiyê nede pirsgirêkên civakî û li gorî xwe biryaran dide, biryarên ku dide jî dibin pirsgirêk ji bo mirovan. Pirbûna kirîz û pirsgirêkan li cîhanê ji encamên ku mirov bi xwe biryara xwe nade, yek ji wan pirsgirêkan jî pirsgirêkên hawîrdorê ne. Soşel ekolojî ku wekî hizrekî pir berfirehe bal dikşîne li ser pirsgirêkên hawîrdorê yên çêdibin ku sedema wê hawîrdor bixwe ye, lê sedema wê mijarên siyasî jî ku dibin beşekî ji peydakirina pirsgirêkên hewîrdorê, mînak çemê Firatê ji ber ku bendav li ser hatin avakirin û hat girtin bu sedema pirsgirêkên siyasî yên di navbera Tirkî û Sûriyê de, bi taybet Rojava de, ew bû sedema ku av bibe, ewqas zayendên derdora bendavê bên kuştin, gelek kes bê av bimînin û çem bixwe êdî ziwa bibe.

**Peywendiya di navbera ekolojî û mirov de pêwîst e bi çi awayî be û di roja meya îro de ev peywendî bi çi awayî ye?**

Gerek pêwendî di navbera mirov û hawîrdorê de hebe ku mirov girîngiya parastina hawîrdorê bibîne. Ji ber berdewamiya jiyanê li ser rûyê erdê, pala xwe dide di hevsengiya vê têkiliyê, nehevsengiya vê têkiliyê dihêle ku jiyana mirovan li ser rûyê erdê ber bi dawî ve biçe. Di civaka xwezayî de rêzdariya mirovan ji bo hawîrdorê û nasîna wê wekî zindiyekî dihişt ku karibin bihev re bi awayekî rehet jiyan bikin. Lê roja îro ev têkilî pir xerab bûye, mirov xwezayê wek tiştekî ku dikare desthilatdariyê li ser bike û ne li gorî pêwîstiyên xwe bikar bîne, dinere. Yanî tiştê binerd bê sînor bikar tîne, ew jî ber bi dawîbûnê diçin. Roja îro jî em metirsiya ava binerd jiyan dikin, wekî din gazên ku zirarê didin hewayê pir bikar tên, ew jî dihêle ku hewaya me bê guhrandin. Van salên dawiyê jî em dibînin çiqasî ziwabûn çêbûye û pirsgirêkên hawîrdorê pir bûne, wekî germahiya pir bilind a ku bandor dike ku gelek mirov û zindî bi sedema wê bimrin. Guhertina navbera demsala de jî çê dibe, em hemû jî îro vê yekê jiyan dikin ku em ber bi kaûsên mezin ve diçin ji kêmbûyîna av, xwarin û windakirina hinek zindiyan li ser rûyê erdê. Lewma gerek mirov di wê hişmendiya ku vê têkiliyê sererast bikin a jî wê di jiyanekî zehmet de jiyan bike.

**Peywendiya di navbera jin û elokojî de di çi astê de ye? û giringiya ekolojî ji bo jin çi ye?**

Gelek şîrove li ser vê mijarê hene ku çima têkiliya jin ji ya mêr cûdaye bi xwezayê re. Ji bo wê jî gelek kes vedigerin civaka xwezayî ku jin her bi îstqrar û bêçare bû hewîrdor û zindiyan nas bike ku bizanibe çawa mezin dibin, hem jî bizanibe lawirên derdorê çawa zarok tînin. Lewma bi têghaştina vê yekê jinê bêtir xweza nas dikir û girêdana wê pê çêdibû. Ya din jî ji xwezaya jin bixwe ye ku zarok tîne, dema zarok tîne hestê wê hemberî wê zarokê çêdibe û bi wî hestî dizane ku hestê lawirekî li hemberî zaroka wî çi ye. Ji bo vê jî her ew bihestyarî nêzîkî xwezayê dibe. Heya roja me ya îro jî em vê hestî bi jinê re dibînin ku jin ya bi xwezayê re mijûl dibe û goh didê, hem jî bi lawiran re jî mijûl dibe û kedî dike, bi taybet jin lawiran kedî dike, xwedî lê derdikevin, daran diçîne û keskayî çêdike, heta di hundirê malê de jî ya herî zêde rêvebiriyê dike jin e.


Lewma têkiliya xurt a bi xwezayê re ya jinê ye. Eynî demê ya herî zêde ji pirsgirêkên hawîrdorê re bandor dibe jin e. Ev pêwendî her di dîrokê de jî hatiye naskirin yekemîn yê ku hat bindestkirin jin û xweza bûn, ji ber tê nerîn ku jin jî weke beşekî xwezayê ye, ev nayê wateya ku mêr ne beşekî xwezayê ye, lê mejiyê mêr di dîrokê heta niha tê naskirin ew diçû nêçîr dikir û lawir dikuştin, ev jî tiştekî nexwezayî ye ku mêr bixwe diyar kir. Lê pir girînge xweza bê parastin ne tenê ji bo jin, lê ji bo hemû mirovahiyê. Dîsa jî dibêjim ê herî zêde bi pirsgirêkên hawîrdorê re bandor dibe di roja îro de jî jine, mînaka wê bisedan jin ji derên dûr cihê ku av tunebe, av dikşînin ji bo malên xwe, gelek serjimarî hene ku li aliyê Iraq û Sûdanê jinên temen biçûk ji bo malbatên xwe dev ji xwendina xwe berdidin, ji bo ku bikaribin pêwîstiyên avê tenê pêk bînin û gelek pirsgirêkên din jî hene, lê ev pirsgirêka bi şert û mercên hawîrdorê re herî zêde bandoriya xwe li jinan dike.

**Çi peywendî di navbera azadî û ekolojiayê de heye?**

Ev pirsekî pir girînge û pir jî li ser wê nayê axaftin, têkiliya di navbera ekolojîk û azadiyê de me vedigerîne ekolojiya civakî ku mirov ne azad be, nekare hawîrdora xwe biparêze û mijarên desthilatdarî mijarên herî dijî ekolojî ne. Ji ber mirovên ku ne li ser erda xwe jiyan bikin, nikarin wê erdê biparêzin. Gelek şîrove hene ku mirovên resen ên xwediyên erdê xwe, zêdetir erdê xwe diparêzin, mînaka wê li ber çavê me ye li "Efrînê" heta ku gelê resen ên Efrînê li Efrînê jiyan dikirin, xwezaya wan xweş bûn û darên wan pir bûn, lê piştî dagirkeriyê xwezaya Efrîn ziwa bûye. Gelên ku desthilatdarî li ser wan hebe xwezaya wan xerab dibe, lewma azadî û ekolojî girêdayî hev in, ev jî girêdayî sîstema cîhanê giştî ye, ya ku azadî tê de tune ye.

**Ji bo ku hîn bêtir pêzanîna kes an jî civakê ya naskirina ekolojî û pêkanîna erkên ku dikevin ser milê wan bikin, pêwîst e çi were kirin?**

Ji bo têkiliya di navbera ekolojî û mirovan de sererast bibe gelek şîrove hene. Lê dîsa jî em vedigerin bingehê vê mijarê ku ew guhertina sîstema rêvebirina civakê ye. Ya din belavkirina hişmendiyê ye, çiqas em karibin çanda ku mirov li ser pê bandor bûn weke çanda kaptîlazîmê ku mirovan dûrî rastiya jiyana wan dibe û bi mijarên kirîzan re mijûl dike, rakin. Ji bo wê jî erka li ser milê me ku em bikaribin niqaşên berfireh bi her kesî re bikin, ji wan re zanyarên ekolojîk ên dawî parve bikin. Da ku bi wan re çareseriyê peyda bikin û wan bikin xwedî biryar li ser erkê wan. Îro jî sîstema ku Rêber Apo nîşan dide û girîngiya komînan ew yek ji mijarên ku wê bihêle têkiliyan mirovan bi xwezayê re sererast bibe. Ew ya herî zêde ye ku pirsgirêkê ji kokê de çareser dike. Ne wekî niha ku em di dewletên navnetewî de dibînin her dem çareseriya pêşkêş dikin, ji bo ku bala mirovan li ser vê mijarê bibin ku bi tiştên biçûk mijûl dibin. Lewma divê hişyariyek çê bibe, divê em bi koka mijaran re mijûl bibin, ne bi encamên wan re. Dualitiya dewlet-netew û welatên cîhanê yên ku ji bo ekolojîk diaxivin derdikeve pêş, dema li aliyekî qedexeya bilastîkê dikin û li aliyê din jî çekan çêdikin ji bo mirov û xweza pê bê kuştin. Koka çareserkirina pirsgirêkên ekolojîk nenavendîbûna sîstema ye. Îro jî pêşkêşkirina Rêber Apo ji bo sîstema Neteweya Demokratîk li ser bingehê ekolojî û azadiya jin, yek ji mijarên çereserkirina pirsgirêkên hawîrdorê ye. Heta ev sîstem neyên guhertin wê her mirov êşa kirîzên hawîrorê bikşînin. Lewma hêşyarkirin û perwerdekirina di vî alî de gelekî girîng û pêwîst e.





# 'Desteya Hevbeş nêzîkbûnên yekîtiyên rewşenbîran xurtir kir'

Cîgira serokê Desteya Rewşenbîr û Nivîskarên Rojavayê Kurdistanê Anahîta Sîno destnîşan kir ku desteyê hevgirtina yekîtiyan xurtir kir û got, "Armanca nivîskar û rewşenbîrên Rojava ew e ku bi hev re xebateke yekgirtî li ser asta Rojava û Kurdistanê bidin meşandin."

**Navenda Nûçeyan**

Di 7'ê Adarê de Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya, Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê bi hevbeşî Dîdara Giştî li dar xistin.

Ev civîn ji bo meşandina karê rewşenbîrî yê hevbeş, li Hola Zana ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Di 18'ê Adarê de jî nûnerên her 5 yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran, li gorî encamên Dîdara Giştî civiyan. Herwiha di encama wê civînê de daxuyaniyeke nivîskî parve kirin. Ji bo rêxistinkirina karê saziyên eleqedar 'Desteya Hevbeş ya Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê' hate damezrandin. Armanca vê desteyê ew e ku bibe kesayeta nûner a nerînên hevbeş di qada çandî ya Kurdî de. Nexasim ji hêla çalakî û boneyên neteweyî û niştimanî di warê çanda Kurdî de ku nasname û ruhê gelê Kurd weke nûnerekî bibandor biparêze.

Derbarê kar û xebata ku ji hêla desteyê ve ji wê demê heta roja îro hatiye meşandin, cîgira serokê desteyê Anahîta Sîno ji rojnameya me re axivî.

'Di şoreşê de, hemû yekîtî xizmeta Şoreşa Rojava kirin'

Anahîta destnîşan kir ku di Şoreşa Rojava de hemû yekîtiyên rewşenbîrî bi rêbazên xwe xizmeta şoreşê kirin û wiha got: "Bi dirêjahiya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê gelek sazî hatin avakirin, ji van saziyan jî yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran ava bû. Her yekîtiyekê li gorî derfet û rêbaza xwe xizmeta şoreşê kirin, di cîhanê tevî de yekîtiyên rewşenbîran tunene, tiştekî balkêş e ku di şoreşê de yekîtî hatin damezirandin, lê pirsgirêk ew bû ku hejmara wan gelek bû. Ev pirbûn bû cihê rexneyê û hat gotin ku yekîtî bûne mîna tevger û partiyên siyasî yên Kurdî û bi wan bandor in. Lê di rastiyê de her saziyek cuda bû ji ya din û parçebûn çênebû. Ji xwe hejmara wan jî li Rojavayê Kurdistanê giha 5 yekîtiyan, hertim armanca me ew bû ku hemû yekîtî bibn yekîtiyek an 2 yekîtî. Ji ber vê yekê jî hewldanek berî 2 salan çêbû da ku sîwaneke ji bo hemû yekîtî û rewşenbîrên derveyî yekîtiyan were avakirin, civîn hatin lidarxistin jî, lê mixabin ev xebat bêencam ma."

**'Desteya Hevbeş nêzîkbûnên yekîtiyên rewşenbîran xurtir kir'**

Anahîta Sîno da zanîn ku Desteya Hevbeş ya Rewşenbîr û Nivîskaran hevgirtina yekîtiyan xurtir kir û wiha domand: "Weke rewşenbîr û nivîskar me armancên nêz û dûr dan pêşiya xwe, armanca dûr ew e ku zaziyeke rewşenbîrî di siberojê de ava bikin û armanca nêz ku em sîwanekê ava bikin ku her 5 yekîtiyên rewşenbîrî bigihîne hev. Li ser bingeha van armancan jî civîn hatin lidarxistin, paşê desteyeke hevbeş ji hemû yekîtiyan hate damezrandin. Wekî em dizanin pirbûna yekîtiyan tê wateya cudahiya Ramanan, ev yek jî zengînbûneke, lê diviyabû sîwanek were avakirin. Deste weke encama rêziknameya dîdara rewşenbîran ava bû. Berî ku dîdar çêbibe jî



danûstandina yekîtiyan bi hev re hebû, lê bi avabûna desteyê xebat û têkiliyên rewşenbîran xurtir kir. Ji her yekîtiyekê du nûnerên wê ji bo desteyê tê bijartin, hem jî serokek û cîgirê/a wê her 3 mehan tê hilbijartin, da ku ti kes ji xebata hevbeş bêpar nemîne. Armanca desteyê bêguman xurtkirina têkliyên rewşenbîrî, piştgiriya QSD'ê pêkanîna nêzîkatiya partiyên Kurdî û lidarxistina çalakiyên hevbeş bû."

**'Hewildanên xebata rewşenbîrî di asta Kurdistanî de hene'**

Encamên Dîdara Giştî ya Rewşenbîr û nivîskaran weke rêziknameyê ji bo me ne, li ser vê bingehê me biryar da ku divê çalakiyên hevbeş bên lidarxistin weke salvegera koça Cegerxwîn, Roja Zimanê Kurdî, şewata Sînema Amûdê û hwd… di heman demê de me sardana Partiya Yekîtiya Demokrat, ENKS'ê û partiyên din kirin, hem jî gelek bone bi hev re pîroz kirin. Ji aliyekî din ve jî hewldaneke me heye ku em herin Başûrê Kurdistanê, lê heta niha hîna zelal nebûye ku wê kî here, ji ber ku dibe hin yekîtî neçin, di vê derbarê de em naxwazin hûrbîniyan bidin, lê em ê di dema pêş ya guncav de li ser biaxivin. Armanca me ne tenê sardana Başûrê Kurdistanê ye, lê belê armanc ew e ku em serdana tevahiya Kurdistanê bikin, da ku xebateke hevbeş bidin meşandin û lêvegerke Kurdî-rewşenbîrî ava bikin, wê ev yek jî di dema guncav de were eşkerekirin. Herwiha em pirên çûnûhatinê di navbera rewşenbîrên herçar parçeyên Kurdistanê çêbikin. Gelek armanc û xewnên me hene, em bi hêvî ne ku bi hev re bi yek dilî û yek armancê em xewna şoreşê bi cih bînin."

# Koma Stêra Zêrîn: Armanca wê pêşxistina rola jin di qada hunerî de ye

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Berpirsyara Koma Stêra Zêrîn Rehef Zilfo diyar kir ku koma Stêra Zêrîn bi armanca diyarkirina rola jin di qada hunerî de hate avakirin û got, " Armanca me pêşxistina rola jin di qada hunerî de ye."**

Koma Stêra Zêrîn di sala 2018'an' de û bi armanca diyarkirina rola jin di qada hunerî de hate avakirin. Herwiha ji destpêka avabûna xwe ve koma Stêra Zêrîn hewl dide ku rola jin di qada hunerî de pêş bixe. Di heman demê de, ev kom piranî stranên folklorî pêşkêş dike û kom ji heşt jinan pêk tê. Weke tê zanîn têkiliya jinan bi stranê re, ji roja ku tê cîhanê ve dest pê dike. Ji dayik û dapîrên xwe lorînan dibihîse û ew bi xwe dibe lorînên jiyanê. Stran ji strandina hestan û bi pratîkê re xweşikirina jiyanê pênase dike. Di nava beşên hunerê de yek jî muzîk e, heta destpêka civaka xwezayî diçe û çavkaniya xwe ji vê taybetmendiya jinan digre. Stranên ku afirandine, çavkaniyên wê û jiyana wê bi xwe ne. Muzîka Kurdî navê hemû cureyên stranbêjî û awazên kilasîka girêdayî dengbêjiya gelê Kurd.

Di derbarê avabûn û xebatên Koma Stêra Zêrîn berpirsyara Koma Stêra Zêrîn Rehef Sêlfo ji Rojnameya me re axivî.

**'Armanca me pêşxistina jinê di qada hunerî de ye'**


Rehef Sêlfo anî ziman ku koma Stêra Zêrîn bi armanca diyarkirina rola jin di qada hunerî de hate avakirin û wiha got:" Koma Stêra Zêrîn ji bona pêkanîna armancên pêşerojeke biserkeftî hate avakirin. Herwiha ji bona guhertina hişmendiya kevin û avakirina hişmendiyeke nûjen li şûna wê hate avakirin. Ji ber ku di wê demê de komên hunerî yên li Rojavayê Kurdistanê piranî komên giştî bûn. Komên hunerî yên xweser ku jin bi xwe amûrên hunerî lêxe li Rojava bi giştî tunebûn. Li ser vî bingehî koma Stêra Zêrîn hate avakirin, herwiha armanca bingehîn ji avakirina koma Stêra Zêrîn diyarkirina rola jin di qada hunerî de bû. Di heman demê de, mebesta bingehîn a Koma Stêra Zêrîn pêşxistina rola jin di qada hunerî de ye."

**'Koma me ji heşt jinan pêk tê'**

Rehef axaftina xwe wiha berdewam kir: "Kar û xebatên me heta astekê bi rengekî baş tên meşandin û koma me ji heşt jinan pêk tê. Koma Stêra Zêrîn tevlî hemû çalakî û şahiyan dibe, şahiyên mîna Cejina Newrozê, 8'ê Adarê, 27'ê Mijdarê hwd… dibe. Lê koma me piranî tevlî festîvalan dibe. Herwiha festîval jî hin bi astin û hin bê astin, herwiha festîvalên ku bê ast bin em rola xwe têde dilîzin. Di heman demê de, heta niha em derbasî festîvaleke bi ast bûne û di wê festîvalê de xelate baştirîn strana filiklorî me stanid. Niha em amdekariyên xwe ji bo festîvalên ku werin lidarxistin, dikin."

**'Em piranî stranên folkolî pêşkêş dikin'**

Rehef Sêlfo anî ziman ku ew piranî stranê filiklorî pêşkêş dikin û wiha pê de çû: "Em piranî stranê filiklorî pêşkêş dikin. Ji ber ku di vê demê de gelek stranên me yên filiklorî windabûne. Em dixwazin bi riya hunera xwe stranên filiklorî zindî bikin û nehêlin ku wenda bibin.



Di heman demê de, em piranî stranên hunermend Aram Dîkran pêşkêş dikin. Di destpêkê de gelek astengî bi me re derketin, astengiyên weke kêmbûna mamosteyan û pirsgirêkên malbatan. Lê bi serkeftina me ev yek hate çareserkirin, israr û armanca me hişt ku em hîn zêdetir bi hêz bibin." Berpirsa Koma Stêra Zêrîn Rehef Sêlfo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ez bi hêvî me kesên ku heskirina wan di aliyê hunerî de heye, ji bona pêkanîna wê têkoşînê bikin û hemû astengiyên heyî derbas bikin."

# Akademiya Civaka Demokratîk: Afrînera fikirê demokratîk û azadiyê ye

Selwa Ehmed diyar kir ku Akademiya Civaka Demokratîk di qada perwerdeya civakî di herêmê de xwedî rol û girîngiyeke mezin e û wiha got: "Perwerde û xebatên fikirî li ser esasê azadiya jin, demokrasî û ekolojî tên dayîn."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Akademiya civaka demokiratîk di 6`ê meha 2013'an de hat vekirin. Kongireya yekemîn bi navê Nûrî Dêrsimî li bajarê Amûdê hat lidarxistin. Piştî konfiransa yekemîn navê wê hat guhertin û ji navnenda Nûrî Dêrsimî bû Akademiya ronakbîrî û ramanên azad. Piştre bi navê Akademiya Civaka Demokiratîk hat ragihandin û tespîtkirin. Şaxên akademiyê li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin.

Akademiya Civaka Demokiratîk ji dema damezrandina wê heya roja îro li ser bingeha civakeke exlaqî, siyasî û di bin diruşmeya ronîkirin û azadkirina civakê hatiye avakirin. Akademî bi perwerdekirin û avakirina kesayetên civakê hatiya avakirin. Li ser vê bingehê jî kar û xebatên ku akademî dide meşandin ew e ku tevahî civak, pêkhate, endam û kesayetên xwende û nexwende yên di nava civakê de di perwerdeyê re derbas bike û wan li ser remanê azad pêşbêxe. Herwiha zanebûn û perwerdekirin bingeha avakirina mirovan ne. Ji dema destpêkirina Şoreşa Rojava heta roja îro Akademiya Civaka Demokiratîk roleke pir girîng di nava civakê de lîstiye. Ev pêşketin jî bi çavan tên dîtin û di nava civakê de guhertinên ku hatine çêkirin di milê pêşxistina hizrê ku bi salan di serê civakê de hatibû rûniştin û guhertina wê pêkanîn. Hişmendî û fikirê netewperestî, olperestî, nijadperestî ewqas di nava civakê de hatiye rûniştin, bi saya Şoreşa Rojava ya ku li ser bingeha azadiyê hatiya avakirin, Akademiyên Civaka Demokiratîk dikarîbûn vê rolê bi awayekî serkeftî bilîze.

Di derbarê kar û xebatên Akademiya Civaka Demokratîk, Kordînasiyona Adademiha Civaka Demokiratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selwe Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

**'Perwerde li ser 3`ê qonaxa tê dayin'**

Selwe Ehmed diyar kir ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê perwerde li ser 3 qonaxan tê dayin û wiha got: "Ji bo kar û xebatên me yê li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê me 7 kordinasyon destnîşan kirin, da ku karê Akademyên li



Firatê, Cizîrê û Helebê pêk bînin û bi awayekî serkeftî were bi rêvebirin. Em dixwazin karê xwe bi awayek piratîkî û baş birêve bibin. Di akademiyên me yê Civaka Demokiratîk de herî zêde em girîngî didin gotinên Rêber Apo, em her dem dixwazin fikrê Rêber Apo di nav gel û civakê de vejîn bikin. Her wiha Akademiya Civaka Demokratîk her pêkhateyek di nava xwe de dihewîne û qebûl dike, em cûdahî nakin navbera tu kesî de. Armanc ji vê yekê perwerdeyeke îdolojîke û danasîna Netewa Demokratîk ji tevhî civakê re ye. di akademiyê de jî sê qonax hene, qonaxa yekemîn ji bo ew kesê ku cara yekem tevlî kar û xebatê me dibin û pêwîstiyê wan bi fikir û fesefeya Rêber Apo heya ku karîbin bingehek ji xwe re bidin avakirin, ev perwerde jî li ser asta mehekê tê dîtin, her wiha qonaxa dûyemîn jî ji bo ew kesên ku hîn zêdetir xwe aliyê îdeolojîk de kur bikin û li gor asta wan fesaziyan wan li cihên guncav tên cêkirin ji bo rêvebirina kar û xebat, belê di qonaxa duyemîn de jî perwerde li asta 45 rojan û girtî tê dîtin, di heman demê de qonaxa sêyemîn jî li ser asta sê mehan tê dîtin û di vê qonaxê de li ser esasê îdeolojîk û hem jî jiyanî perwerde tên dayin, di encam û derçûna qonaxa sêyem de, kadiroyên Civaka Demokrat tên destnîşan kirin da ku ew kes bikaribin ji bo civakê bibin mînek."

**'Perwerde bi awayekî diyalogî tê dayin'**

Selwe da zanîn ku dersên di Akadimiyê de tên dayîn girîngin û wiha pêde çû: "Dersên ku li Akademiyê tên dîtin, pir girîngin ji bo avakirina kesayeta mirov, herî zêde em bal dikşînin li ser civakeke demokratîk. Her wiha dersên Jineolojî tên dayîn ji ber ku civaka bêy rêvebirina jin nabe civakek saxlem. Di bernameya Akademiyê de spor heye, li hev kombûyîn û jiyanek hevbeş heye.




Heye ji me tê em dixwazin ku jiyanek hevbeş û komînal di navbera kesên di akademiyê de ava bikin, da ku ev kesên ku perwerde dibînin, karîbin civak jî li ser vê esasê perwerde bikin. Her wiha her dersek komisyonek wê heye û bi şêwazekî pispor dersên xwe şîrove dikin da ku peyamek raste rast bighînin kesê hazir. Dersên ku tên dayîn jî bi awayê diyalogî tê dîtin ji ber ku dema mirov şêwazê wî/wê yê diyalogî pêş dikeve dikare gelek serkeftinan di jiyanê de pêş bixwîne. Bê guman ji bilî dersên îdeolojîk jî, wekî film, sinefiziyon û belgefilm tên temeşekirin. Di heman demê de pêşbirk jî di akademyê de tên çêkirin ev pêşbirk jî ji pareznameyên Rêber Apo agahî tên derxistin, ev jî ji bo pêşxistina asta kesên di akademiyê de ye."

**'Em dixwazin wekhevî û civakeke demokratîk ava bikin'**

Selwe Ehmed destnîşan kir ku ew dihêlin kesê di akademiyê de bibe xwedî berpisyarî û xwedî bawerî û doman: "Em her dem dixwazin ku hevalên di akademiyê de fêrî berpisyariyê bikin, da ku ji xwe bawer bin û bikarîbin di her civakekê de xwe îfade bikin. Girîngtirîn jî ew e ku jin wateya xwe nas bike û li pêşiya zilamê serdest bibe bersiv. Em dixwazin di her alî de wekheviyekê çêbikin û civakeke demokratîk ava bikin. Dema ev kesên di akademiyê de derdiçin erk ew e ku em wan bişopînin û encama perwerdeya wan bibînin. Bê guman di perwedeyên me de jî hemî pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî dibin, akademiyên me ne tenê ji bo pêkhateyên kurdin. Yek ji armancên perwerdeyên me ew e ku çawa hemî pêkhate bi hevre jiyan bikin û hezkirinê di nava xwe de mezin bikin."

**'Di salê de nêzî 4 dewreyên sê mehan tên vekirin'**

Selwe Ehmed di dewamiya axaftina xwe de wiha got: "Her dem em hewil didin ku pergala xwe ya akademiyê baş birêve bibin. Hijmara kesên tevlî perwerdeyan jî dibin pir başin. Di salê de nêzî 4 dewreyên sê mehan tên vekirin û di hundirê her dewreyekî de jî hijmarek baş ji civakê tevlî dibin. Dewreyên tên dîtin jî bi 2 zimanan tê dayin, ziman Erebî û Kurdî û niha jî asta me ya wergerê baş bûye di hundirê her perwerdekê jî wergera ziman heye. Her wiha perwerdeyên me yên 45 rojan, di vê salê de kêm hatin vekirin, ew jî ji ber rewşa ewlehiyê."

Girêdayî Akademiya Civaka Demokiratîk; Navenda Lêkolînan

Selwa da xuyakirin ku girêdayî akadeniya Civaka Demokiratîk navenda wan a Lîkolînan heye û wiha bê de çû: "Di navendê me yê lîkolînan de, di her 6 meh carekê de kovar derdikeve, di naveroka wê kovarê de hemî mijarê lêkolînê ne, mîna hevpeymana civakî, lozan, şaredarî, hunerê rêveberiyê û hwd.. beş beş gotarên wan tê nivîsandin. her wiha li ser mijarên tên lêkolîn kirin jî, wekî civîn tê li darxistin û wiha tê parvekirin. Bê guman her hefte gotar tê nivîsandin, di heman demê de fîlmê animasyonjî tê çêkirin, ew film jî li ser Rêber Apo, şehîdan û Şoerşê tên hazir kirin û li ser kenala Ronahî Tv tê barve kirin."

**'Perwerde li ser esasê azadiya jin, demokrasî û ekolojî tê dîtin'**

Kordînasiyona Adademiha Civaka Demokiratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selwe Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Akademiya Civaka Demokratîk, yek ji bingehên perwerdeya civaka demokratîk hate damezrandin. Di vê akademiyê tê dîtin ku navenda perwerde û xebatên fikirî li ser esasê azadiya jin, xweserî, demokrasî û ekolojî bingeha xwe ava dike. Akademiya civaka demokratîk bi awayekî ku ew kesên tên perwerde kirin, bikaribe li ser rûmet û pêşketina civakê bandorê çêkin. Ji hêla vê akademiyê ve, nîqaşên li ser nasîna civak, dîroka civakê, şopandina rolên demokratîk tên kirin. Akademiya Civaka Demokratîk di qada perwerdeya civakî de xwedî rol û girîngiya herêmî û stratejîk e."

**Akademiya Civaka Demokratîk**

-Navenda giştî ya Akademiya Civaka Demokratîk li Hesekê ye.
-Li Dêrik, Terbespiyê, Qamişlo, Amûdê, Derbêsiyê, Helebê, Dêra Zorê û Tebqa Akademiyên Civaka Demokratîk yên giştî hene.
-Li Til Hmeîs û Reqayê Akademiya Civaka Demokiratîk a giştî û ya xweser heye.
-li Cezayê jî Akademiya Civaka Demokiratîk heya lê belê ev akademî vekirî ye, ne girtî ye.



# Li herêmên dagirkirî sûcên dijmirovî

Herêmên Sûriyê yên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê ve hatine dagirkirin, veguherîne navendên sûcên dijmirovî. Ev çend sal in gelên li van herêman dijîn bi kuştin, revandin , işkence û talakirinê re rû bi rû dimînin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker bi dehê salan e li dijî gelên herêmê siyasetên qirkirin û hilandinê dide meşandin. Ji xwe armanca wê jî dagirkirina tevahî herêmê ye û nûjînkirina impratoriya pêkanîna Osmanî. Piştî destpêkirina kirîza Sûriyê di sala 2011'an de, dewleta Tirk boi hemû hêza destwerdana nava xaka Sûriyê kir û hewil da şerê navxweyî derxîne. Bi dewama kirîza Sûriyê re dewleta Tirk dest bi birojeya dagirkirina axa Sûriyê kir. Di destpêkê de bajarên Sûriyê yên mîna Izaz, Cerabils û Babê dagir kir, piştî wê jî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî û herî dawî jî bajarê Minbicê û Şehbayê jî dagir kir. Dewleta Tirk û çeteyên wê herêmên dagirkirê kirin mîna navendekê ji kuştin, revandin, dizî, işkencekirin û talankirinê re.

**Ji destpêka dagirkirina Efrînê û het niha kiryarên dijmirovî berdewam in**

Dewleta Tirk a dagirker li gel çeteyên xwe di 20'ê Çileya 2018'an de li dijî Efrînê dest bi êrişeke dagirkeriyê kir û piştî berxwedaniya serdemê ya 58 rojan, Efrîn hat dagirkirin. Ji destpêka dagirkirinê û heta niha çete her roj kiryarên hovane li dijî gelê Efrînê didomînin. Mîna ku ev jî têrê nake, Şehba dagir kirin û zêdeyî 100 hezar Efrînî careke din koçber kirin. Li gorî Peymana Cenevreyê ya sala 1948'an û qanûnên navneteweyî, ev kiryarên li dijî gelê Efrînê sûcên şer in. Gelê Efrînê tê qetilkirin, revandin û her roj êşkenceyên cuda li wan tê kirin. Ji bo mirovên têne revandin jî fidye tê xwestin. Efrîn ji aliyê ewlehiya jiyanê ve veguherî bajarekî metirsîdar. Bi dagirkirina Efrînê re hate xuyakirin ku hemû dewletên hegemonîk bi dewleta tirk a dagirker re hevkarin. Li Efrînê jin rastî kiryarên hovane û dijmirovî tên û siyaseteke qirêj li dijî wan tê meşandin. Gelek tişt weke lixwekirina hicabê û nederketina ji malê li ser jinan têne ferzkirin. Li Efrîn herî zêde jin têne hedefgirtin. Hejmareke mezin ji jinan di girtîgehan de di bin êşkenceyê de hatin qetilkirin.

Kiryarên dijmirovî li Efrîn di nava 7 salan de:

Zêdeyî 9 hezar kes ji wan hezar jin in, hatine revandin.

Zêdeyî 683 kesî bi êşkenceyê hatine qetilkirin.

Zêdeyî 101 jin, ji wan 10 bi îdîaya xwekuştinê hatine qetilkirin.

Zêdeyî 74 jin rastî destdirêjî û tundiyê hatin.









Zêdeyî 400 hezar dar hatin birîn, ji 4 parên zeviyan 3 par hatin şewitandin.

Zêdeyî 30 mal û kampên mêtingeriyê hatin avakirin.

Zêdeyî 134 cihên dîrokî, zêdeyî 28 cihên ziyareta olî hatine hilweşandin.

**Rola HTŞ`ê çi ya?**

Wek tê zanîn ku piştî helwişîna rêjîma Bassê, Heyat El-Tehrîr El-Şam (HTŞ) hat li ser dethiledariya Şamê ku niha bi hikumeta Şamê ya veguhêz tê nasîn, lê tu guhertin bi xwere ne da avakirin, berovajî wê bi xwere gelek pirsgirêk û ne çareserî anî.

**Dagerkirina Serêkaniyê**

Di 9'ê cotmeha 2019`an de bajarê Serêkaniyê, Girê Spî gundewarên van bajaran hatin dagirkirin. lîstoka binavê qadên ewle avakirinê de hatî lîstin di 7'ê Tebaxa 2019'ande bi tifaqa dewletên yekbûyî yên Emerîkayê û Tirkiyê de xistin meriyetê. Bi pêkanîna vê tifaqêre ji bo ku dewleta tirkiyê êrişên xwe hîn hêsantir bikaribe pêkbîne hêzên Amerîka xwe ji hêrêmê vekişandin. Bi vî awayî dewleta tirk a dagirk êrişên xwe yên liser herêmê xistin meriyetê û bi fermî hêzên Emerîka, bajarên Girê spî û Serêkaniyê radestî dewleta tirkiyê kirin.

Êrişên dagirkeriya Tirk yên di dîroka 10-13'ê Cotmehê li hemberî sivîlan çeka fosfor hat bikaranîn. Li gor lêkolîna rêveberên PEAS enstutiya Swîsrê bikaranina çekên fosfor hate tespîtkirin. Di rapora ku ji aliyê Dr. Ebas Mensur ve hatî amadekirin de çend cureyên şewatê hatine dîtin û hate gotin ku dewleta Tirk li hemberî sivîlan çeka kîmyewî, gazên asfîksîk, jehrîn ku di asta navneteweyî de qedexeye hatine bikaranîn. Piştî êrişa leşkerî dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê, deverên rojhilatê bajarê Serêkaniyê tevî bajarê Girê Sipî bi kûrahiya nêzî 30 km dagirkirin û ev dever di navbera komên çeteyan de hatin parvekirin. Rapora Yekîtiya Navneteweyî ya 2020 diyar dike ku hêzên leşkerî yê girêdayî tirkiyê di herêmên dagirkirî de sûcên şer pêk tînin. Hemû êrişên da Tirkeriyê û niha rêvebirina herêmên dagirkirî, ji hêla dewleta Tirk û komên çete tê kirin. Herêmên Dagirkirî di nav komên cuda de hatin parve kirin. Talan, destavêtina li ser mal û milk, koçberkirin, guherandina demografî, girtin, revandin, îşkence, kuştin, binpêkirina mafên jinan û terora rojane ya li dijî gel li herêmên dagirkirî pêk tê.

**Kiryarên li Girê Spî tên kirin**

Rêjîma Baas di sala 2012'an de ji bajarê Girê Spî vekişiya û gelek komên cuda yên tundirew wekî Ehrar El-Şam, El-Farûq, Cebhet El-Nusra û hwd. xwe di nava wê herêmê de bi cih kir. Di wê demê de derdora 106 kom derketin holê. Dewleta Tirk bi awayekî veşartî alîkariya koma El-Farûq û Cebhet El-Nusra dikir û Kurd ji cih û gundên wan derdixistin. Ev jî encama siyaseta dewleta Tirk bû û bi destê çeteyan pêk dihat.

**Kaniya hovîtiyê ye**

Di navbera pêkhateyên Girê Spî de tu nakokî nîn bûn. Berovajî wê hemû pêkhateyên herêmê bi jiyana xwe ya hevbeş tên naskirin. Dewleta Tirk a dagirker ku ji vê aramiyê ne razî ye, ji ber vê yekê êrişên dewleta Tirk a dagirker ku di sala 2015'an de dest pê kir, di van demên dawîn de zêdetir bûn. Ev êriş bi taybet li hember gundê li ber sînor ên wekî Til Finder, Sosik, Yabse û El-Esel zêdetir pêk hat. Gelek caran dewleta Tirk li ser navê çeteyên DAIŞ'ê di nava bajêr de tevlihevî çêkir. Armanca wan jî ew bû ku welatiyên herêmê ji hev dûr bixin, nakokî û bêbawerî di navbera gelan de çêbike û bi rêkê jî careke din bajêr dagir bikin. Li aliyekî din jî yek ji armanca dewleta Tirk ew e ku bi van êrişên xwe gelên li ser sînor koçber bike. Di êrişên dewleta Tirk de ku bi armanca dagirkeriyê berdewam dikin. Dewleta tirk û çeteyên wî di 9`ê Cotmeha 2019`an de êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Li dijî êrişan şervan û gel berxwedaniyeke bêhempa nîşan dan lê di encama bikaranîna çek û teknîka herî pêşketî ya dewleta tirk de, Girê Spî û Serêkaniyê hatin dagirkirin. Dewleta tirk tevgera dagirkeriyê di bin navê Kaniya Aştiyê de dest pê kir lê encamên ku li ser rûyê erdê derkevin pêş, nîşan didin ku kaniya hovîtiyê ye.

**Projeya guhertina demografîk**

Li aliyekî din jî dewleta Tirk a dagirker ji bo projeya xwe a guhartina demografîk temam bike dem bi dem malbatên wan komên çekdar yên bi ser Tirkiyê ve weke malbatên çeteyên Idlibî, malbatên Îraqî û kesên biyanî anîn herêmê û li malên kurdan bi cih kirin. Herwiha di van demên dawî de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê senariyoya revandina DAIŞ'ê ya li girtîgehan dan ragihandinê. Bi vê hincetê DAIŞ'ê perwerde dikin da ku di demên pêş de kiriyarên ku bên kirin dewleta Tirk a dagirker neyê sucdar kirin.

**Çandina fikrê netewperestî û olperestî**

Di sala 2022'an de dewleta Tirk a dagirker dest bi rêbazekî nû ya gûhrtina demografî kir. Vê polîtîkayê jî bi riya firotina malan a li herêmên dagirkirî, mîna kesê ji ware xwe hatine koberkirin, xêniyê wan didin firotin. Li aliyekî din jî dewleta Tirk a dagirker ji bo herêmê di warê fikrî û bawerî de li gor fikrê Osmaniya nû pêşbixîne û fikrê Islama Tundrew belav bike girîngî dide dewreyên ezberekirina Quranê li mizgeftan. Bi vê rêbazê çandina fikrê netewperestî, ol perestî di nav jin û zarokan de dide çêkirin. gûhartina demografî jî ewe ku çandekî dûrî çanda resen a herêma Serêkaniyê bê jiyîn, di heman demî de ferq û cudahî di nav pêkhateyan de bê çêkirin, kurdan bi qirkirinekî nû re derbas bikin.

**Dagirkirina Minbic**

Bi krîza Sûriyê re gelek komên çete ketin Minbicê, lê belê hemû jî ji hev xirabtirin. Ji ber ku kiryarên wan li dijî gel, bi heman awayî ne. Bi destpêkirina krîzê re KOMêN Çete yên bi navê Artêşa Azad ket herêmê û dest bi diziya mal û milkên welatiyan kir. Paşê DAIŞ'ê tarîtiya xwe li Minbicê ferz kir, ji revandina mêran û tirsandina jinan bigre heta qetilkirin û recmkirinê her tişt qewimî. Minbic ji sala 2014'an heta 2016'an wisa ma, lê bi pêngava Hêzên Sûriya Demokratîk û YPJ'ê rizgar bû. Piştî ku rêjîma Bass hat helweşandin, Minbic careke din ji aliyê Tirkiyê û çeteyên wê ve hat dagirkirin. Piştî dagirkirinê li Minbicê kuştin, dizî, talankirina malan, revandina jin û ciwanan a bi armanca fîdyeyê gelekî zêde bû. Ji bilî van kiryar û sûcan jî, her roj komên çeta di nava xwe de şer dikin û sivîl dibin qurban.

**Aştî ne dan avakirin, lê belê tirs dan avakirin**

Li Minbicê jin ji her gavekî ditirsin ku nikarin ji malê xwe derkevin. Ji ber ku her jin û zarok rastî destdirêjiya çeteyên El Emşatê tên. Welatî jî li ser zarok û jinan ditirsin. Ji ber ku çete amade ne êrişî her malê bikin û keçên ku dikevin ber çavên wan, di bin gefa çekan de direvînin û dibin. Ji bilî van jî xizmetên elektirîkê û avê sekinîne û nan jî tune ye, yanî li Minbicê tê xuyakirin ku jiyan bi hemî aliyê xwe ve hatiye fetisandin. Qaşo dibêjin ku em hatine aştî û ewlehiuyê di herêman de çêbikin, lê mixabin ji bilî kuştina jiyan û tirs ne dan avakirin.

Li Minbicê her diçe rewş xerabrtir dibe. Komên çeteyên ku bajar dagirkirine, kiryarên dijmirovî û ne exlaqî didomînin. ji ber qerebalix û tunebûna ewlehiyê malbat û ciwan ji herêmê koç dikin. Jin jî bi zêdebûna rewşên revandin û destdirêjiyê, di nav mercên gelek xirab de dijîn. Niha jî gelên ku li Minbicê dijîn, dixwazin vegerin dema xwe ya bi ewlehî û aramî. Gelê Minbic dibêjin ku "em nikarin vê yekê bikin ger ku hêzên QSD û YPJ'ê tune bin". Ji ber ku ji dema krîza Sûriyê heta niha bi azadî û ewlehî nejiyane, ji bilî dema ku QSD û YPJ`ê Minbic diparastin. Tê texmînkirin ku rewş bi vî awayî bimîne, dê kesek li Minbicê nemîne û her kes koçber bibe.

# ‘Ferzkirina dorpêçê wê pirsgirêkên heyî kûrtir bike’

**Hevserokê Meclisa Giştî a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo da zanîn ku di pêkanîna peymana 1'ê Nîsanê de pirsgirêk hene, li derdor wê tê zivrandin û hikumeta veguhêz dixwaze cewherê wê bê wate û got, “Hikumeta veguhêz bi siyaseta dorpêçê sotemeniyê derbas taxê nake û berdewamiya dorpêçê wê pirsgirêkên heyî aloztir bike “.**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di 1’ê Nîsanê de, Meclisa Giştî ya taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û hikumeta veguhêz a Şamê rêkeftinek ku ji 14 xalan pêk dihat îmze kirin. Ev lihevkirin di çarçoveya ku ewlekariya gelê Kurd û hemû pêkhateyan di hundir taxê de her wiha xwesertiya her du taxan bê parastin, hat îmzekirin. Hêjayî bîrxistinê ye ku hemû bendên vê lihevkirinê nehatin pêkanîn, di çarçoveyeke teng de ma. Hikumeta Şamê ya veguhêz li Helebê niha ne tenê xalên lihevkirinê bin pê dike, di heman demê de dixwaze zextê li ser her du taxan bike, ev yek jî bi ferizkirina siyaseta ku di dema dawî de ketiye meryetê, dike. Têkildarî rewşa dawî a Helebê, siyaset û dorpêça ku hatiye ferzkirin her wiha rewşa jiyanî a gel, Hevserokê Meclisa Giştî a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo ji rojnameya me re axivî.



kirin. Ev peyman bi erêkirina li ser 14 bendan bi awayekî fermi di navber nûnerê hikumeta veguhêz û Rêveberiya Meclisa her du taxan de hat îmzekirin. Di wê lihevkirinê de hin bend pêk hatin, hinek qels man û hinek jî nehatin pêk anîn ku heya niha jî ev itîfaq berdewam dike. Di pêk neanîna vê lihevkirinê de pirsgirêk heye, peyman îmze bû lê niha liderdor wê dizivirin û dixwazin cewherê wê bê wate bikin.”

## ‘Dixwazin cewherê hevpeymanê bê wate bikin’

Nûrî Şêxo di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser lihevkirina di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê a veguhêz de û wiha got: “Hatina hikumeta Veguhêz ji bi hemû gelê Sûriyê re hêviya jiyan û pêvajoyekî nû bû ku wê rewşa gel him di aliyê ewlekarî û him jiyanî de biguhere û Sûriyê ber bi istqrarê ve biçe. Weke ku em hemû jî bûna şahid ev yek nebû berovajî wî Sûriye di qonaxa talankirin û qirkirina pêkhateyan re derbas bû.

Piştî hatina hikumeta veguhêz rêze lihevkirin û danûstandin di navber Rêveberiya Xweser û wan de di asta Heleb û giştî Sûriyê de hatin çêkirin. Armanca van lihevkirinan ku em bi hev re jiyaneke aram ava bikin û Sûriyeke nenavendî ji bo hemû gelan, olan, mezheban û pêkhateyan bê avakirin. Her wiha em giştî di Sûriyê de li hev biçivin û pirsgirêkên xwe weke gelên ji vê axê çareserbikin. Di vê çarçoveyê de 10’ê Adaerê lihevkirinek di navber Fermandarê HSD’ê Mazlûm Ebdî û Ehmed El Şeraa de hat îmzekirin. Piştî wê di 1’ê Nîsanê de lihevkirinek di Helebê de hat

## Hikumeta heyî ne serbixwe ye

Nûrî di berdewamiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Di oxira pêkanîna bendên vê peymanê de gelek gav hatin avêtin, hin xalên weke me aniye ziman pêk hatin; hêzên leşkerî ji taxê derketin, ewlekariya hevbeş di navber Asayîş û hêzên ewlekariya hikumetê de hate kirin, girtî ji her du aliyan ve hatin berdan lê bi temamî girtiyên me nehatin berdan, her wiha çûnûhatina ji aliyê bajêr û taxê de divê bi ewle bûya lê me didît ku ciwanên me dihatin girtin, tiştên wan jê dihatin birin û hwd.

Bê guman hikumeta vaguhêz di lihevkirin, danûstandin û di siyaseta xwe de ne bi serê xwe ye. Em hemû jî dizanin rasterast destwerdanên hêzên herêmî li Sûriyê tê kirin. Hemû lihevkirin û negihandina çareseriyê di Sûriyê de ji er wan welatan tên kiirn, naxwazin ku çareseriyeke bingehîn di Sûriyê de bê avakirin, tunebûna xwe di çareseriya Sûriyê de dibînin ji ber hemû berjewendiyên wan li ser gel û siyaseta Sûriyê dimeşe. Di asta yekemîn de jî Tirkiyê viya dike. Di peymana 10’ê Adarê de jî ev tişt pêk anîn, rayadarên ast bilind rêkirin Sûriyê da ku ev lihevkirin neghînin encaman. Bi van nêzîkatiyan bê îradebûna hikumeta nû tekez dibe.”



## ‘Armanca me parastina bendên peymanê ye’

Nûrî diyar kir ku ji beriya 20 rojan rewşeke aloz û cuda derket û wiha domand: “Ji 20 rojan de rewşeke aloz û kirêtîk ji aliyê hikumeta veguhêz hatiye destpêkirin. Bi taybet bi rêya medya civakî û zimanê ragihandinê de êrişek li ser Rêveberiya Xweser, herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û her du taxên Helebê tê kirin. di van êrişan de xuya bû kesên lawaz, bê çare û bê îrade cihê xwe tê de digin. Bi van êrişan re em dikarain pirs bikin, gelo kî dike? ma 14 sal ji êriş, reşkirin û talankirinê ne bes in. bi sed hezaran însan hatin kuştin û bi milyonan koçber bûn, binasaziya Sûriyê hat talankirin. Gelo ji bi pêşeroja Sûriyê ev nêzîkatî guncaw in? em bersiva van bûyer, nêzîkatî û pirsan net zelal dixwazin. Armanca me em bendên hevpeymana ku hatiye îmzekirin biparêzin. Hevbeşiya parastinê di Helebê de dewam dike, em her du jî naxwazin deriyê êrişan vebe.”

## ‘Berdewamiya dorpêçê wê pirsgirêkên heyî aloztir bike’

Nûrî têkildarê dorpêçê wiha anî ziman: “Di mijara ambargoyê de gelê me diçi aliyê bajêr û tên, alavên pêwîst li gorî derfetan derbas dibin, lê sotemenî derbasî taxê nabe. Ji demekê de ev pirsgirêk tê jiyan kirin û heyanî niha jî nehatiye çareserkirin. Bi taybet niha em ber bi demsala zivistanê de diçin divê sotemenî li ser gel bê belavkirin, ger bi vê awayê berdewam bikin heyanî zivistanê wê rewş pir cuda be, rewşa taxê di hemû aliyan de him jiyanî hin jî derûnî wê zehmetir be. Di berdewamiya vê dorpêçê de aliyê elektrîk û jenetoran de wê pirsgirêk derkevin, firinên nan wê bandor bibin. Divê hikumeya veguhêz rewşa heyî ber çavan re derbas bike û rê nede ku ev pirsgirêk aloztir bibin bi demê re”.

Nûrî di derbarê rewşa jiyanê a gel û taxê de wiha got: “Rewşa her du taxan û bi giştî Heleb di encama gefan, kiryar û êrişên bi rêya ragihandinê de rewşek metirsiyê heye û zemîneke bê istqrariyê daye avakirin. hinek kar û barên ku gel di taxê de dike bi gelemperî, qels bûye. helbet dema di nav gel de berdewamiya kar kêm dibe, jiyan zehmet dibe. Gel jî li gorî defetên heyî rojane di nava têkoşîneke jiyanî de ne û liber xwe didin. Rûxmî hemû rewşan lê gelê me ji rastiyên ku tên jiyan kirin ne dur e”.

## ‘Tişta ku di Efrînê de tê kirin binpêkirina bendên lihevkirinê ye’

Nûrî di dawiyê de ev anî ziman: “Yek ji bendên her du lihevkirinan jî ku her koçberek li ku dibe bila bibe, divê vegere ser xaka xwe. Ji bo Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê jî ev bi xetên stur hatin gotin. Lê niha em li rewşa Efrînê dinêrin xuya dike ku tiştên aloztir tên çêkirin. Hikumeta veguhêz bi tena xwe tevdigere. Ev jî revandina ji lihevkirinê ye. Dixwazin ciwanên Efrînê tevlî nav hêzên ewlekariyê bikin. Dixwazin dîmenekî wiha derxînin ku Kurd di Efrînê de tevî hikumeta nû dibin û bi her tiştî razî ne. Di cewher de ev gav li dijî lihevkirina ku hatiye îmzekirine û projeyek qirêj tê meşandin em jî vê gavê protestu dikin.”



## Hikûmeta veguhêz ji nepêkanîna peymana 10’ê Adarê berpirsyar e

**Dilyar Cizîrî**

Di 10’ê Adarê de di navbera Fermandarê Giştî yê QSD’ê Mazlûm Ebdê û Serokê veguhêz ê Sûriyê de peymanek ji 8 xalan pêk tê hate imzekirin. Ev peyman piştî komkujiyên li Perava Sûriyê bi çend rojan pêk hat. Her kesî wiha hêvî dikir ev gav bibe zemînek ji bo dawîkirina komkujî û tundiyê. Bi taybet di xalên wê de beşdarkirina hemû pêkhateyan di qadên siyasî yên dewletê de, hebû. Ragihandina agirbestê li tevahî xaka Sûriyê û vegera koçberan a bi rumet. Ev sê xalên giring ên peymanê ne. Li kêleka wan mijara degelresyona saziyên Rêveberiya Xweser ên sivîl û leşkerî jî hebû. Xalek di mijara redkirina kîndarî û hewldanên derxistina tevlîheviyê û têkoşîna li dijî wê rave dike, heye. Di mijara mafê civaka kurd de jî xalek hebû.

Ji xwe beriya peyman were imzekirin, bi çend rojan hikûmeta veguhêz a Sûriyê di bin navê “Kongreya Niştimanî” de komxebatek li gorî xwe lidar xist. Nûnerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Elewî û Durziyan hatin dûrxistin. Nûnerên herêmên din jî ên li gorî hikûmetê û dewleta Tirk hatin neqandin. Piştî peymanê jî danzana destûrî ya li gorî xwe û bêyî xalên peymana 10’ê Adarê di ber çavan re derbas bikin, ragihandin. Di xalên destûrê de kopiya destûra dema Baas’ê hate rêzkirin. Pirengî û cûdahiyên li ser xaka Sûriyê di ber çavan re ne hat derbaskirin.

Di mijara kîndarî û belavkirina hewldanên derxistina tevlîheviyê jî xebatkarên ragihandina hikûmeta veguhêz bigre û hejmarek mezin ji berpirsên wan, kampanyên dijberî û kîndariya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dan meşandin. Hîn jî didomînin. Di mijara vegera koçberan de tevî şandeyên Rêveberiya Xweser di 2 civînên danûstendinê de bal bi xurtî kişand ser vê mijarê û giringiya vegera koçberên Serêkaniyê, Efrîn, Girê Spî, Bab, Ezaz û Minbicê, lê hikûmeta veguhêz di vê derbarê de yek gava erênî neavêtiye. Tevî li gorî peymanê pêwîstbû ku mafê gelê Kurd were misogerkirin. Lê hikûmet li dijî konfransa Yekrêzî û Yekhewlesta kurdî derket. Şandeya Kurdan dê biçe Şamê di ber çavan re derbas ne kir. Ew ji ne dîtî ve hesibandin. Ji xwe di mijara degleresyonê de heta niha saziyên hikûmetê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nînin. Saziyên Rêveberiya Xweser ên sivîl û ên leşkerî di nava saziyên dewletê de cih ne girtine. Ema li ser ragihandin û daxuyaniyên xwe dibêjin gerek QSD’ê xwe fesix bike. Endamên wê jî bi awayekî kesayetî di nava Artêşa Sûriyê de bi cih bibin. QSD’ê û Rêveberiya Xweser di hemû gavên Peymanê de baldare. Lê heta niha hikûmeta veghêz a Sûriyê ji ber di bin bandora komên çekdar ên girêdayî Tirkiyê de ye û nikare xwe ji wan rizgar bike. Di tu xalan de gav ne avêtiye. Di mijara têkoşîna li dijî DAIŞ’ê de hêza wê ya xwe bi cih bike nîne. Her di nava hewldanan de ye bandorê li raya giştî bike. Wiha diyar bike ku QSD’ê û Rêveberiya Xweser li gorî peymanê tevnager û di mijara degelresyonê ne amade ye. Lê li vir tişta diyar dibe, hikûmeta veguhêz ji degleresyona sivîl û leşkerî bi tirse.



# ‘Damezrandina Komisyona Demokrasî Xuşk- Biratî û Hevgirtina Netewî gavek girîng e’

**Parlementerê Partiya DEM ya Amedê Mehmet Kamaç destnîşan kir ku piştî banga Aştî û Civaka Demokratîk, damezrandina Komisyona Demokrasî, Xuşk-Biratî û Hevgirtina Netewî gaveke girîng û erênî ye ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd."**

**Amara Baran/Qamişlo**

Rêber Apo di 27’ê Sibatê de banga Aşitî û Civaka demokratîk kir li ser wê esasê komîsyonek ku ji 51 kesê pêk tê hat damezrandin, lê rûxmê wê jî çapemeniya AKP’ê bi zimaneke ku pêvajo pêş naxe, bikartîne. Di vê çarçoveyê de Parlementerê Partiya DEM’ê Mehmet Kamaç ji rojnameya me re axivî.

## ‘Pêvajo yek alî nameşe’

Parlementerê Partiya DEM’ê Mehmet Kamaç di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Bi banga 27’ê Sibatê ya Rêber Apo re PKK’ê kongreya xwe ya 12’mîn li darxist û biryara xwe fesihkirinê da, di heman demê de li ser daxwaza Rêber Apo û bi îradeya xwe ya azad di 11’ê Tîrmehê de komek gerîla ku ji 30 şervanan pêk dihat li Başûrê Kurdistanê parezgeha Sileymaniyê merasîma çekşewitandinê pêk hat. Çekşewitandina gerîla ji bo tevahiya cîhanê peyamek bû. Heta wê demê jî pêvajo bi yek alî pêşve diçû û heta niha jî gavên şênber yek alî tên avêtin. Lazime dewleta Tirk êdî destê xwe bike bin kevir û di pêvajoyê de rol bileyêze, ji ber ku pêvajo bi yek alî nameşe. “

## ‘Damezrandina Komisyonê pêngavek girîng bû’

Kamaç balkişand ser komisyona ku hatiye avakirin û got: “Komisyona ku li ser bingeha Aştî û Civaka Demokratîk bi awayek fermî hat qebûlkirin û di zemîneke hiqûqî de xebatê dimeşîne. Komîsyona “Demokrasî, Xuşk- Biratî û Hevgirtina Netewî” di kombûna xwe ya



yakem de nexşereya xebata xwe xêz kir û li ser wî esasî dest bi xebatan kir. Damezrandina komisyonê pêngavek girîng e. Di rûniştina 5’mîn de bi dayikên Aşitiyê, dayikên Şêmiyê û dayikên Esker û polêsan re rûniştin. Dayikên Aşitiyê dema ku xwestin bi Kurdî biaxivin û xwe îfade bikin, komisyonê rê nedan wan ku bi zimanê xwe biaxivin û hestên xwe bînin ziman, ev jî ji bo me cîhê xemgîniyê ye.”

## ‘Zimanê çapemeniyê xizmeta pêvajoyê nake’

Kamaç da zanîn zimanê çapemeniya nêzî AKP xizmeta pêvajoyê nake û wiha domand: “Zimanê desthilatdariya AKP û çapemeniya wê ku heta niha bikar tînin xizmeta pêvajoyê nake. Ger ku li Tirkiyê hindek tişt bên guhertin di serî de pêvajo ji bo demokratîkbûna Tirkiyê û ji bi çareserkirina pirsgirêka kurd e û pêwîst e hemû aliyan wek bawerî, ol, îdeolojiyan xizmeta wê bike, pêwîst e berya hertiştî ziman bê guhertin. Zimanê ku desthilata AKP’ê bikar tîne û çapemeniya Tirkiyê jî têgîhîştina gelê Tirkiyê diguherîne dijbertiya pêvajoyê ye. Em gelek caran bi rêya bangawaziyan hişyariyên xwe dikin, ger bixwazin pêvajo pêş bikeve lazime hûn zimanê xwe biguherînin û gavên şênber bên avêtin.”

## ‘Pirsgirêka Kurd tevahiya Rojhilata Navîn eleqeder dike’

Mehmet Kamaç anî ziman ku Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji bo aşitiyek mayînde di Rojhilata Navîn de pêk were, pêngaveke dîrokî ye û wiha domand: “Pirsgirêka Kurd di Rojhilata Navînde bi milyona însana eleqeder dike, di demên dawiyê de di şer û pevçûnan de gelek berdelên giran hatin dayîn, helbet wê çareserkirina pirsgirêka Kurd aramiyekê di Rojhilata Navîn de ava bike. Ger dewletên heremî di serî de Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê ji bo ku demokratîk bibin, di serî de pêwîst e pirsgirêka Kurd çareser bikin. Daxwaziya me ew e ku herkes piştgiriya vê pêvajoyê bike ji bo ku serkeftina pêvajoyê bibe serkeftina hemû aliyên civakê. Ji bo wê jî piştgirî û kar û xebatên hemû aliyan girîng e. Pêwîst e hemû alî rexne, pêşniyar û fikren xwe bînin ziman.”

## ‘Pêwîst e li Tirkiyê yasayên nû bên çêkirin’

Mehmet Kamaç wiha domand: “Sedsala 21’ mîn bi fikrên xwe ava bikin. Di nav civakê de berê bi guman nêz dibûn, lê niha hêviyek heye ku pêvajo bi awayek serkeftî bê maşandin. Daxwazên gel ji Tirkiyê heye ku gavên şênber bavêjin, şert û mercên Rêber Apo bên sererastkirin, ji ber ku Rêber Apo faktora serekeye ku heta niha pêvajo bi yek alî rêve biriye. Heman demê de pêwîst e li Tirkiyê yasayên nû bên çêkirin, girtiyên ku li ser esasên dozên siyasî di girtigehan de ne bên berdan, herwiha bi salan e Qayûm tê rêveberin ew rejîm ji holê rabe ew pêngavên heyî wê baweriyekê li ser pêvajoyê ava bike û civak jî bi wê baweriyê nêzê pêvajoyê bibe.”

## ‘Însiyatîfa Yekîtiya Demokratîk ji bo parastina destkeftiyan sîwaneke bingehîne’

Mehmet Kamaç behsa însiyatîfa yekîtiya demokratîk ku di 11’ê Gulana 2025’an de deklerasyona xwe li Amedê pêk anî kir û axaftina xwe wiha qedand: “Însiyatifa yekîtiya Demokratîk ku ev salake zêdetir xebatê dimeşîne, hedefa wê ew e ku sîwaneke hemû aliyên siyasî, civakî, bawerî û netewên ku li Kurdistanê dijîn bi aqleke hevpar bi nêrîn û ramanên hevpar ava dike. Ev saleke bi awayekî serkeftî didome, Însiyatîfa Yekîtiya Demokratîk wê li Kurdistanê bibe sîwaneke ku herkesek di nav de cîh bigre. Rêxistinkirina însiyatîfê hê jî didome. Ji bo xortkirina însiyatîfê daxwaza me ew e ku herkesek di avakirin û deklerasyona însiyatîfê de cîh bigrin.

Ji bo girîngiya yekgirtina Netewî Konferansek di 26’ê Tîrmehê de li Amedê hat li darxistin. Konferans bi tevlîbûna hemû beşên civakê bi serkeftî derbasbû, di demeke dîrokî de girîngiya yekîtiya netewê bi aliyên civakê re gotûbej kir. Konferansa duyemîn jî wê di 12’ê Cotmehê li Bajarê Mêrdînê bê lidarxistin bi sernavê” Bihevre Jiyana Cûdahiyên Bakûrê Kurditanê” ji bo ku hemû ol û bawerî û hemû netewên ku li Bakûrê Kurdistanê dijîn ji bo ku fikir û ramanê xwe bînin ziman. Însiyatifa Yekîtiya Netewî ji bo parastina destkeftiyên Kurdan û ji bo hemû aliyên ku hatine înkarkirin wê bibe sîwaneke girîng.”

## Erdogan di qirkirina Kurdan de bi israr e…



**Zekî Bedran**

Gelo li Sûriyê derfetekê ku avakirina dorhêleke demokratîk û asayi hey e? Ev ne wisa ye. Bêguman, rejîmeke zordar serdest bûye û gel birçîyê azadiyê ye. Rêzikname, burokrasî û pergala kevnar hatiye hilweşandin. Di vê rewşê de, pergaleke demokratîk dikare li gorî daxwazê were bicîhanîn û hêviyên gel dikarin werin bicîhanîn. Hat dîtin yên ku şûna Baas’ê li Şamê hatine ser desthilatê, tişta ku pêktînin ji ya rejîma Baas xirabtire. Şêwaza wan a fikirîn û jiyanê ji dîrok û civaka Sûriyê pir cuda ye. Ew hişk in, li ser bingeha olî ne û hişmendiya wan cuda ye. Ew li dijî demokrasiyê ne. Ev bi ti awayî ne alîgirên azadiya jinê ne. Ev hişmendiya kevneperest a ku Tirkiyê jî piştgirîya wê dike. Hişmendiya Erdogan ji ya wan pir ne cuda ye. Li Tirkiyê demokrasî û zagon di kok de hatiye birîn, piştgirîdayîna kiryarên HTŞ’ê, di nav de komkujiyên li hemberî gelên Durzî wê piştrast dik e. Ji bilî vê, HTŞ’ê ji aliyê hikumeta Tirk ve dîl hatiye girtin û bi destê wan tê sazûmankirin. DYA, Fransa û Brîtanya dixwestin beşdarî danûstandinên di navbera Şam û Rêveberiya Xweser de bibin û wekî navbeynkar tevbigerin da ku bigihîjin çareseriyekê. Ji bo vê armancê civînek li Parîsê hatibû plankirin, lê Tirkiyê ew taloq kir. Wê roleke avaker ne lîst. Dibe ku ev danûstandin hin maf bidin Kurdan û nemaze çareseriyek demokratîk biafirînin. Dema ku dewlet wekî navbeynkar tevdigerin, têkbirin an jî dûrxistina vê yekê dijwartir dibe. Ji ber vê yekê, wan HTŞ’ê ji danûstandinan vekişand. Wezîrê derve yê Tirkiyê ji pirsgirêkên Tirkiyê bêtir bi pirsgirêkên Sûriyê ve mijûl e. Ew hewildan dike ku Rêveberiya Xweser gef dixwe û zextê li wan dike. Dema ku gefên Erdogan li ser vê yekê zêde dibe, eşkere dibe ku dixwazin Sûriye têxin nav çi cure aloziyên xwînî. Erdogan dibêje, “Dema ku şûr tê kişandin, mafê qelem û peyvan namîn e.” Ev gotin ne ji HTŞ’ê re hatibûn kirin. Yên ku di bin gefê de ne, di serî de Kurd û herêmên xweser in, ku hikûmetek demokratîk ava kiriye. Bi milyonan mirov ji hemî neteweyan, di nav de Kurd, Ereb, Suryanî û Asûrî, li vê herêmê bi hev re bi wekhev dijîn. Erdogan dibêje, “Van hemûyan bidin aliyekî û soza dilsoziya xwe bidin HTŞ’ê.” Bêşensiya mezin a Sûriyê ew e ku cîranê wê yên mîna Erdogan heye. Dema ku Sûriyê ket nav şerê navxweyî, Erdogan roleke pêşeng lîst û sînorên xwe ji bo DAIŞ, El Nusra û komên din yên çete vekir. Hikumetê nêrîna xwe ya li ser gelê Kurd neguhertiye. Dibêjin werin em li Tirkiyê biratiyek Kurd-Tirk ava bikin, lê ev yek bi rastî xwe ne teyisandiya jiyanê. Ger ew ê bi Kurdan re bibin bira, çima ew qas hewl didin ku wan li Sûriyê tine û qir bikin? Piraniya Kurdan di nav sînorên Tirkiyê de ne. Hejmara wan li Sûriyê ji ya li deverên din ên welêt kêmtir e. Dema ku hûn bi Kurdên li Tirkiyê re bibin bira, hûn bi xwezayî piştgiriya Kurdên din digirin. Çima hûn wan li dijî hev dikin, rûxmê ku hûn dikarin piştgiriya Kurdan giştî bistînin? Erdogan dibêje yên ku bi Enqere û Şamê re tevbigerin, dê bi ser bikevin. Ji ber vê yekê, divê em bipirsin, Enqere bi kê re ye? Çîrokên bê bingeh têne çêkirin da ku Kurdan ji holê rakin û têk bibin. Rêxistinên Kurd û armancên wan têne biçûkxistin û raya giştî li dijî wan tê sorkirin. Di çapemeniya Tirkî de, bi berdewamî gef li Kurdan tê xwarin. Kurd vîn û hebûna wan nayê dîtin; ew her gav ji hêla hêzên biyanî ve wekî amûr têne bikar anîn. Kurd wekî mirov nayên hesibandin; ew nayên dîtin. Ew weke piyonên DYA, Îsraîl û hwd tên bikaranîn. Ger hûn hemû deriyên çareserî û jiyanê ji bo Kurdan bigirin, hûnê ji wan çi hêvî bikin? Ji bilî tinebûnê, radestiyê, ti bijarteyek din li ber wan nayê hiştin. Dewleta Tirkiyê niha artêşa xwe li ser sînorên Iraq û Sûriyê bi cih kiriye da ku Kurdan têk bibe û li ser wan serweriyê ava bike. Sûriye û Iraq lawaz bûne û hêza wan tine ye ku Kurdan têk bibin. Ji ber vê yekê, Tirkiyê ji bo ku kiryaran pêk bîne, wan bi 10 hezaran leşker li Iraq û Sûriyê bi cih kirine. Ew bi berdewamî li hevkariyê bi hikûmetên van welatan re dixwazin, hewl didin ku wan li gorî polîtîkayên xwe bidin tevgerandin. Wan karî Iraqê li gorî vê sazûman bikin. Lê Beşar Esed wekî ku Erdogan dixwest tevnegeriya. Ji hêla din ve, HTŞ’ê bi tevahî di van polîtîkayan de cih digire û bi Tirkiyê re hevalbend e. Hikûmeta Tirkiyê qaşo rojnamevanên ku bi navê Abdulkadîr Selvî li ser şerê ku ew plan dike û karesata ku li benda Kurdan e nivîsand. Selefiyan zêde dike, “Ji bo êrîşek li ser QSD’ê û Rêveberiya Xweser li benda fermana Erdogan e. Dema ku were erê kirin, HTŞ, eşîrên Ereb û SMO dê êrîşek bidin destpêkirin û wan ji holê rakin.” Ma Erdogan serok e an jî fermandarê giştî yê Sûriyê ye? Çima fermana êrîşê dide? Ew bi gotina “Tirkiye tevlî şer nebûye û êl û eşîr, HTŞ û hwd. li dijî QSD’ê şer dikin” gelên cîhanê bixapînin.

Encama êrîşên HTŞ’ê yên li dijî Elewî û Durziyan komkujî û wêranî li Sûriyê pêkhat. Dûyê li ser van herêman hîn jî belav nebûye. Bifikirin ka dê çiqas komkujî çêbibe ger ew bi hêzên bihêztir û bi piştgiriya tevahî ya Tirkiyê êrîşî Kurdan û herêmên xweser bikin! Ev komên çekdar heta zagonên şer jî binpê dikin. Guh nadin zarok, jin an tiştekî din. Kurdan çi bi Tirkiyê kirine ku komkujiyek wisa li dijî wan plan kiriye? Ma divê welatî û rewşenbîrên Tirkiyê li ser vê yekê lêpirsîn û nîqaş nekin?



## Serdema Aştiyê

**Farûk Sakik**

Piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê, siyaseteke nû li rûyê cîhanê belav dibû. Ji bo mirovahî, wan êş û elemên di serdema şer de, carek din nekşînin, ketin nav hewldanan. Sazî û dezgehên ji bo mafên mirovan hatin avakirin. 1’ê Îlonê jî wek roja aştiya cîhanê hat destnîşankirin. Neteweyên Yekbûyî, aliyê xwe yên siyasî derxist pêş û got: 21’ê Îlonê bila bibe roja aştiya cîhanê. Lê sazî-rêxistrinên sosyalîst û sosyal demokratan jî, roja destpêka şerê Hîtler 1’ê îlonê watedar dîtin û ew roj wek roja aştiyê îlan kirin.

Diviya NY’ê midaxeleyî şeran bikira. Lê mixabin, midaxeleyî tu şerekî jî nekirin. Di roja me de dewlet çekên xwe zêde dikin. Sedem jî parastina welatê xwe nîşandidin. Lê di hedefa wan a esasî de, êrişî deverek din bikin, an jî şer bidin destpêkirin heye. Ev yek jî dibin çavdêriyên NY de pêk tê. Dema ev yek pêk dihatin, NY’ê xwe li ‘miritiyê’ dataanî. Lê sazî û rêxistinên mafê mirovan, bi israr midaxele kirin da ku şer dest pê nekin. Piştî ku şer dest pê kir jî, ji bo bi dawî bibe, têdikoşiyan. Ji van kesan yek jî Rêber Apo bû. Li dijî Kurdan şerê tunekirinê hebû û Kurdan jî di 15’ê Tebaxa 1984’an de tevlî vî şerî bûn. Rêber Apo ji bo ev şer dawî bibe û aştiyek mayinde pêk were emrê xwe da. Di 1’ê Îlona 1998’an de di Med TV de di bernameya Gunay Aslan de banga wî hebû. Banga aştiyê. Serokwezîr Bulent Ecevît bû û Devlet Bahçelî jî di hikumetê de bû. Pêlên faşîzmê li asta herî jor bûn. Bersiv di 15’ê Îlonê de serfermandarê hêzên artêşa bejayî Attîla Ateş, li sînorê Sûrî û di 1’ê Cotmehê de Demîrel jî li meclisa Tirkiyê dan. Sûriye tehdît kirin da ku Abdullah Ocalan ji welatê wan derkeve. Di wan salan de li Rojhilata Navîn amadekariya şer hebû û dixwestin kesin li pêşiya vî şerî tasfiye bikin. Dewleta Tirk jî xwe li gor vê polîtîkayê dîzayin kir û daxilî plana şerxwazan bû. Encam: Bedeleke mezin.

Rêber Apo ji Sûrî derket, dîl hat girtin û pêvajoya Îmrali dest pê kir. Lê tu carî hewldanên wî yên aştiyê bi dawî nebûn. Di aştiyê de bi israr bû. Di destpêka sala 2025’an de, her wek serê rayedarên dewleta Tirk, li dîwarekê ketibe, hemû zirara vî şerî îtiraf kirin. Tiştekê din jî îtiraf kirin; israra Abdullah Ocalan a aştiyê. Her çiqas aliyê şer; yên civakî, siyasî, derûnî îtiraf nekirin jî, gotin di vî şerî de me 3 mîlyar dolar pere xerckirin. Ji Rêber Apo nexşerêyeke aştiyê xwestin. Rêber Apo di banga xwe de peyva “aştiyê” derxist pêş. Serdema aştî û civaka demokratîk da destpêkirin. Îsal bi boneya 1’ê Îlonê peyamek şand û got: “Aştiya rastîn; dema azadî, demokrasî û edaleta civakî di hemû qadên jiyanê de kete meriyetê dikare pêkwere”. Ji bo vê yekê jî divê di hemû qadên civakê de, ji bo aştiyê xebat bên meşandin. Bi tenê li bendê bimînin dewlet û hikûmet gavan bavêjin, nabe. Ew li gorî berjewendiyên xwe tevdigerin. Lê civak piştî bêdengbûna çekan divê zextan bide ser rêveberiya Tirkiyê, erkên wan bibîra wan xe, da ku gavan bavêjin. Ev peywira sereke ya serdema nû ya li pêşiya civakê ye. Civaka Kurd di salên 2013-2015’an de fêrî çanda aştiyê bûbûn û wan jî wek Rêber Apo şer nedixwestin. Di aştiyeke rastîn de israr dikin. Îro jî amade ne, bes ev daxwaza wan were birêxistinkirin.